



Bundesministerium
für Familie, Senioren, Frauen
und Jugend



Bundesministerium
des Innern
und für Heimat



Frühe Bildung:
Gleiche Chancen
Bundesprogramm Integrationskurs mit Kind

Programa Federal „Kursa Integrasyonê ya bi Zarok: Bingeha Avakirina Siberojê “

Beşdara gelekî birêz, beşdarê gelekî birêz yê Kursa Integrasyonê,

Da ku hûn zanibin qenc miqate li zaroka/zarokên we dête kirin, dê Çavdêriya Zarokan li gel kursa we be.

Çavdêriya Zarokan dê ji aliyê programa Federal „Kursa Integrasyonê ya bi Zarok: Bingeha Avakirina Siberojê“ ku ji aliyê Wezaretê Federal ji bo Malbat, Kal û Pîr û Ciwanan û bi hevkarîya Wezaretê Federal ya Karên Navxwe û Niştimanî, tê fînansekirin.

Heke zarokgeheke zaroka we diçê nîn be, heke bi şeweyeke bi rêk û pêk li zaroka we nayê miqatekirin, heke zaroka we naçe dibistanê, naçe wargeheke zarokan, hûn dê bikaribin beşdarî kursê bibin û dê Çavdêriya Zarokan li zaroka we/zarokên we miqate be. Bi vê yekê hûn dê bikaribin kursa xwe û pêdiviyên malbatê bi hev girê bidin û bi hev re bimeşînin.

Heke hûn bixwazin ji vê derfetê sûd werbigirin, divê hûn hay ji evan mercan hebin:

- Ji bo radestkirina berpirsiyariya çavdêriyê û bikaranîna vê derfetê pêwîstî bi navnivîsandina zarok heye. **Navnivîsandina karîger ya zarok/zarokan ji gel kesa/kesê sermiyana/sermiyanê (xwedî welayet) zarok/zarokan (ku di rastiyê de dê û bav in) tê pêk anîn.**
- Ev tê vê vateyê: **Di rastiyê de divê dê û bav bi hev re bi Çavdêriya Zarok qaîl bin û herdu alî (dê û bav) jî forma navnivîsandinê îmze bikin.**
- Heke ji dê û bav **yek bi tenê mafdarê sermiyaniya zarok be, ew biryara Çavdêriya Zarokê ku dê an jî bav beşdarî Kursa Integrasyonê dibe, dide û ew bi tenê forma navnivîsandinê îmze dike.**
- Heke ji dê û bav **tenê yek** (dê **yan** bav) forma navnivîsandinê îmze bike, divê ji bo navnivîsandinê **îsbata** jêrîn bête pêşkêşkirin:

- a) **Wekaletnameya ji bo navnivîsandinê** (Wekaletnameya sermiyaniya zarok ya ku îtiraz lê nehatibe kirin û bi şêweyeke aşkere diyar be ku ya kesa/kesê dî yê mafdarê sermiyaniya zarok e: Bi Mail, WhatsApp an jî SMS-ê jî dikare bête şandin, an jî
- b) **Biryara Dadgeha Aîlê, ku tê de hatiye destnîşankirin** dê an jî bavê beşdarî Kursa Integrasyonê dibe, ji bo navnivîsandina zarok/zarokan ya li gel Çavdêriya Zarokan **mafdar e**, an jî
- c) **Biryara Dadgeha Aîlê, ku tê de ji bo sermiyaniya zarok ji dê û bav yek hatiye destnîşankirin** (heke pêwîst be weke mînak di rewşa jiber ji aliyan yek, dê yan jî bav ji sedema ku ji welatê xwe derketiye lê hêj di rê de ye, dikare di vê derbarê de biryarnameyeke lezgîn ya berlêgirtina demkî bête derxistin) an jî
- d) **Biryara Dadgeha Aîlê, ku tê de sermiyanî bi temamî yan jî qismen „Navnivîsandina ji bo Çavdêriya Zarok ya bo li zarok miqatebûnê “ li ser navê dê yan jî bavê ku bi xwe ji bo kursê hatiye nivîsandin, destnîşankirî ye**, an jî
- e) **Agahiya ji qeyda mafê sermiyanîyê ji aliyê Daîreya Ciwanan ya berpirs ku tê de kesa/kesê nav dinivîse weke bi tenê sermiyan e, hatiye destnîşankirin**

Heke pirsîyariyên we hebin, yan jî pêwîstiya we bi alîkariyê hebe, da ku em bikaribin bi hev re çareseriyekê peyda bikin, ji kerema xwe serî li me bidin.

Em di kursa we de ji bo we serkeftin û ji bo zaroka we/zarokên we jî demeke xweş li gel Çavdêriya Zarok, dixwazin!